



Gundê Qûçê | Hîzan | Bedlîs



ISSN 26676443



9 772667 644002



Hejmara 2. | Hezîran • Tîrmeh • Tebax 2019

folklorame

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 2. | Hezîran • Tîrmeh • Tebax 2019

Biha: 15 ₪





Lorîkbêj û çîrokbêj
Fato Albayrak, (1940 / -)



Salihê Heydo
(1956 / -)

folklorame





SPAS JI BO
ALÛKARÎYA WAN
Elî Ugur
Dûrzan Cîrano
Eşref Bolumcu
Ferhad Aslan
Ferîd Mîtan
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Refîk Tekîn
Selmet Guler
Şêxmûsê Çinarî
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉

folklorame 📷 📸 📺

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsiyar e.



Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 1

Hejmar: 2

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevriye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Bahoz Baran, Eşref Keydanî, Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Evîndar Şevîn

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevinç Adiyaman

Wêneyê bergê pêş: Orhan Tanhan

Wêneyê bergê paş: Orhan Tanhan

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađlık ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır


Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Őti.

Orta Mah.Fatin Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Kaniya Stranan
(Narînk, Serê Zava, Şeşbendî û Dîlok)
Nivîskar: Yaşar Kaplan
Weşanxane: Nûbihar



Naverok

5. Ji edîtorî
6. Rê û rêbazên berhevkarîyê, **Mehpûs Serhedî**
14. Zîyaretên gundê Çîçika, **Bêrîvan Matyar**
19. Serbzêr, **Oktay Altûn**
21. Kêç û spî, **Xidir Mûtlû**
22. Peyvên kêmnas yên Pasûrê-2, **Bahoz Baran**
24. Du meselok ji Serhedê, **Evrehmanê Bello**
26. Meletî, di Seyahetnameya Ewliya Çelebîyî da, **Ozcan Çîçek**
32. Hevpeyvîn bi derwêşê folklorê ra, **Eşref Keydanî**
41. Kose, **Remzîye Oncel**
45. Çend gotinên li ser heyvan ji herêma Silopyayê/Şernexê, **Xalid Celalî**
47. Hirî heb ehmeq, **Veysî Arcagok**
51. Folklor, îdeolojî û netewesazî, **Serwext Zana**
60. Lihevanînok, **Elîf Gunduz**
62. Dak û birê, du lîstik ji Erxenîyê, **Nûredîn Vûral**
64. Qewlê “Meshefa Reş” bi zar di sîstêma qewl û beytên êzidîyan da, **Celîlê Celîl**
80. Meryem yarê, **Nêrgiz Guçlu**
82. Sondxwarin, **Mahîr Ugur**
84. Danasîn û nirxandina Herdemciwanê, **Evîndar Şevîn**
88. Çîrokên biwêjan-1, **Asmîn Uyanik**
91. Rengvedana efsanê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da, **M. Şivan Circîs**
110. Kirmanckî de nameyê tayê hacetan û cayê şuxilnayîşê înan, **Surya Human**
113. Tiştikên Semsûrê, **Haşîm Esen**
114. Kilama Xezala Heyderî, **Nihat Oner**
117. Du pêkenok, **Roza Sîerra**



Piştî bihareka têrbaran, havîneka germ bi ser me da girt. Di vê havîna germ da, dilê me jî bi qasî demsalê germ e, lewra hejmara duyem ya Folklor Me bû agirê binê beroşê, kel da dilê me. Kela dilê me, di kelekela havînê da, mêvanê mala we ye. Em li ber derîyê we ne, ku hûn derîyî vekin, Folklor Me li şemûga derîyê we ye, pawok e ku her kurdek jê ra derîyê mala xwe, derîyê dilê xwe, derîyê hişê xwe veke.

Ku we ji şemûgê rahiştê, hûn dê nema bikarin dev jê biqerin. Ev kovar zeliqok e, mirovî bernade, heta hûn neqedînin hûn dê daneînin ji destê xwe. Hûn dê xenî bibin bi folklor gelê xwe. Di ber ra hûn dê bibişirin, biheyirin û dê bibe pistepista we jî. Dê çîrokeka ku dêya we di şevtarîyên zivistanê da ji we ra digot bê bîra we. Li gel rûpelên kovarê hûn dê zorê bidin bîra xwe. Dê derxûna bîra we rabe; dê sond, çîrok, meselok, lîstikên zarokatîya we ji binê bîrê bang li we bikin û bibêjin, “Va hûn em hene û em di bîrê da dijîn.”

Mela Mehmûdê Bazidî, Melayê Erwasî, Sadiq Bahaeddîn Amêdî, Hecîyê Cindî, Cegerxwîn, Celadet Bedirxan, Elaeddîn Secadî, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Salihê Heydo û çendîn kurdên folklorhez guh dan dengê gelê xwe, guh dan bîra xwe. Bi saya serê wan e ku dengê me jî bilind dibe di nava dengên din yên dinyayê da.

Di vê hejmarê da, dê berê we bikeve Meletîyê û hûn rastî bajarekî kurdan bîn, paşê hûn dê berê xwe bidin Lalişa nûranî û ji Kanîya Spî tasek avê vexvin. Li gel Salihê Heydoyî hûn dê li guçên gundên Rojavayê rûnin, ku we bêhna xwe kir der, hûn dê biçin Şerê Xozanê û dengê Xezal û Seyroyê dê ji Agirîyê bê we.

Bi “Serbzêr”ê tehma devê we dê xweş bibe û bi zanîna navên zîyaretên li gundekî Farqînê dê hûn bêhtir baldar bibin. Dê kêç û spî bidin pey hev herine serşoyê û “Kose” bi fen û fûtan heyfa xwe ji axayî û gundîyan bigire. Di şikeftê da dê hirç û mirovek bibin heval û xwesûyek dê bi gotinekê dilê zavayê xwe xweş bike. Dê mişkek bimire û hûtek jî bê kuştin.

Hêvîya “Folklor Me” ew e ku;
her kurdek bi folklor xwe bijî
da ku nemîne kelê û rijî



Rê û rêbazên berhevkarîyê

A. Kî karê berhevkirinê dike?

1. Mamosteyên zanîngehan: Kesên ku di vê mijarê da pisporek in, profesyonel in, bi awayekî akademîk têgihîştî ne.
2. Xwendekarên zanîngehan: Xwendekarên lîsansa bilind ku ji bo amedekirina teze xwe dixebitin û spartekên ku mamoste didin wan bi rê ve dibin.
3. Mamosteyên dibistanan.
4. Kesên dilxwaz in, kesên ji vî karî hez dikin, kesên ku têkilîyên wan û gelî zehf baş in.

Mehpûs Serhedî



folklor; bîr, palpişt û koka gelî ye. Folklor mîna kanîyekê ye, avê dide şaxên jîyana gelî. Divê her kes ji alîyê xwe ve li vê mîrateyê xwedî derkeve. Lewra folklor, keresteyên folklorî mîna masîyekî ku ji destê mirovî bişemite û here, çû êdî vegeer lê tune. Îro roj eger bi profesyonelî nebe jî, bi amatorî be jî kesên dilxwaz jî dikarin destê xwe bi-avêjine berhevkirina keresteyên folklorî. Çunku teknîk û teknoloji bi pêş ketîye û ketîye dest û berîka her kesî. Bêguman eger bi profesyonelî be, eger bi amatorî be, eger bi dilxwazî be; kesên ku li gor derfet, şert û mercên xwe berhevkarîyê dikin hene. Ez ê ji xwîner û dilxwazên “Kovara Folklor Me”yê ra, li gel rêbazên ku dinyayê bi kar anîne û sepandine; qala hinek tecribeyên xwe jî bikim.

A. Folklor çi ye, keresteyên folklorê çi ne?⁽¹⁾

Di îngilîzîyê da folk ‘gel’ e û lore ‘zanîn’ e. Folklor, gelnasîn/gelzanîn e. Ev peyv, cara ewil di 1846an da, ji alîyê arkeologê îngilîz Wîlliam J. Thomsî ve hatiye pênasekirin. Di kongreya beynelmîlê, ya di 1891ê da, ev peyv wekî dîsîplîneka navneteweyî hatîye pejirandin. Herçiqas peyva “folklorê” ji alîyê folklorîst û pisporan ve cur bi cur hatibe pênasekirin jî fikra hevpar ev e ku folklor, çanda madî û manevî ya gelekî, we-latekî ye.

Keresteyên folklorê kurdan ev in:

1. Erf, adet, kevneşopîyên kurdan (adet û rusumetname)
2. Zanyariya gelêrî (Hekîmîya gelêrî, beytariya gelêrî, ajalvanî...)
3. Festîval, pîrozbahî, cejn, ayîn
4. Bawerîyên gelêrî
5. Lîstik
6. Xwarin, vexwarin
7. Cilûberg

(1) Di vê beşê da sûd ji xebata Necat Keskîni hatiye wergirtin.

8. Edebîyata gelêrî
 - a) Mît
 - b) Efsane
 - c) Destan
 - d) Çîrok
 - e) Çîrokên gelêrî
 - f) Pêkenok
 - g) Gotinên pêşîyan, biwêj
 - h) Destan
 - i) Qewlêrk
 - j) Mamik
 - k) Zûgotinok
 - l) Stranên gelêrî
 - m) Zêmar
 - n) Stranên olî (qesîde, berîte)
9. Muzîka gelêrî
10. Hunerên destkarîyê yên gelêrî
11. Navên cih û waran, gund û bajaran.

B. Berhevkin, berhevkarî çi ye?

Berhevkin, ew kar e ku keresteyên folklorê di dem û cihekî dîyar da li gor rê û rêbazên zanista folklorê bi rêya folklornas yan jî amatorên eleqedar, ji gotoxan bi awayê devkî yan jî nivîskî bîna tomakirin. Divê mirov serê ewil bersivê bide van pirsan: “Dê çi, kengî, li ku û çawa bê berhevkin?”

C. Cihên berhevkinê

Cihên ku keresteyên folklorê lê tên peyda-kirin li gor taybetîyên xwe sê kom in:

Koma Yekê: Ew cih in ku teknolojiyê pir kêmandor li wan kirîye. Ev cihên weha zêde neman. Li cihên weha adet, tore, dab û nêrît gelekî zindî ne. Pêwendîyên wan yên bi derve ra, ne zêde ne. Loma cihên weha ji bo lêkolînê û berhevkirina keresteyên folklorî cihên herî baş in.

Koma Diduyan: Ew cih in ku rê û elektrîk

hene û wasîteyên teknolojîyê tèn bikaranîn, lê zêde belav nebûne. Ev der jî ji bo lêkolîn û berhevkirinê bikêr in.

Koma Sisêyan: Ji gund, qeza û bajarên pêşketî pêk tê. Amûrên teknolojîyê bi awayekî berfireh tèn bikaranîn. Ev der li gor mijarên xebatê dibin qada lêkolîn û berhevkirina keresteyên folklorî.

D. Kî karê berhevkirinê dike?

1. Mamosteyên zanîngehan: Kesên ku di vê mijarê da pispor in, profesyonel in, bi awayekî akademîk têgihîştî ne.
2. Xwendekarên zanîngehan: Xwendekarên lîsansa bilind ku ji bo amedekirina tezên xwe dixebitin û spartekên ku mamoste didin wan bi rê ve dibin.
3. Mamosteyên dibistanan.
4. Kesên dilxwaz, kesên ji vî karî hez dikin, kesên ku têkilîyên wan û gelî zehf baş in.

E. Karê berhevkarîyê

ji sê beşan pêk tê⁽²⁾

- Plansazî û amadekarîya berîya derketina qadê
- Dema berhevkarîyê
- Nirxandin, tesnîfkirin, deşîfrekirin û arşîvkirina keresteyan.

1. Plansazî û amadekarîya berîya derketina qadê

- 1) Ji bo berhevkarîyê divê şert û mercên berhevkarê/î yên tenduristî, aborî û civakî guncan be.
- 2) Divê berhevkarek berî her tiştî tesbîta mijara xwe bike, li gor mijara xwe amadekarîyên xwe bike.

3) Berhevkar, gerek li gor mijara xwe bernameya xwe çêbike ku bikare karê xwe birêkûpêk bibe serî.

4) Berhevkar, hewce ye derheqê mijara xwe da pêşxebatekê bike û derheqê mijara xwe da xwedan agahî be.

5) Berhevkar ku mijara xwe kifş kir, divê li gor mijara xwe pirsan amade bike.

6) Berhevkar, hewce ye li gor mijara xwe rêbaza xwe zelal bike. Çavnêrî, hevpeyvîn yan jî anket; dê ji van rêbazên berhevkarîyê kîjanê bi kar biîne? Mijar çiqas ji hev cuda bin rêbaz jî ewqas ji hev cuda dibin.

7) Berhevkar, divê li gor mijara xwe derbarê qadê da lêkolînê bike ku bizane berhemên mijara wê/î li kîjan herêman hene û qada xwe tesbît bike.

8) Piştî tesbîtkirina qadê divê berhevkar derheqê qadê da hin lêkolînan bike û qadê nas bike.

9) Herêma ku berhevkar dê lê bixebitin divê lê bikolin ka berîya wan kesin lê xebitîne yan na? Eger xebatên berhevkarîyê berîya wê/î hatibin kirin divê berhevkar xwe bigihîne wan kesan.

10) Herêma ku dê berhevkarî lê bê kirin, eger berhevkareka/ê din lê dixebite hebe, divê berhevkara/ê ku nû diçe wê herêmê, bi berhevkara/ê berîya xwe ra têkilîyê dayîne û destûra xebatê jê bixwaze.

11) Eger derheqê herêma berhevkarîyê da film yan jî belgefilm berê hatibin çêkirin, divê bèn temaşekirin.

12) Divê berhevkar hay ji rojname û kovarên herêmî hebe.

13) Berhevkar, li kîjan herêmê berhevkarîyê bike divê ziman û devoka wê herêmê baş bizane.

14) Berhevkar, li gor rêbaza berhevkarîyê

(2) Di vê beşê da sûd ji xebata Kenneth S. Goldstein û Perteve Naili Boratavî hatiye wergirtin.



Hecî Bedir û
Mehpûs Serhedî

divê amûrên berhevkarîyê amade bike: lènûsk, pênûs, denggir, makîneya fotoyan, kamera, qertên kamerayan, şarjên kamera, denggir û makîneyan. Bikaranîna van amûran li gor şert û mercên qadê diguhere.

15) Eger berhevkar berhevkarîya xwe bi denggir yanjî bi kamerayan bike, divê berîya derketina qadê van amûrên xwe biceribîne û saxlem bike, bi dû ra derkeve qadê.

16) Ji bo tesbîtkirina gotoxan divê berhevkar bi kesên wekî keya, rûspî, hezkirî, mela, mamoste û bi bijîşkên wê herêmê ra têkilîyên xwe xurt bike.

17) Berhevkar eger mamoste be dikare hem ji xwendekarên xwe sûtê werbigire hem jî bi rêya xwendekarên xwe bi malbatan ra têkilîyê dayîne.

18) Kereste û mîrateyên folklorî bi piranî li cem jinên kurd in û her jin jî her tiştî ji mêran ra nabêje. Lewra berhevkarîya ku jin tê da tune be, kêmasîyeka mezin e.

19) Berhevkar, li gor şert û mercên qadê divê tevdira çûyîna xwe bike: Eger bi erebeyê be, eger bi hespî be, eger bi meşê be.

2. Dema berhevkarîyê

1) Divê kesayetî û qabilîyeta kesên berhevkar ji bo kirina vî karî misaîd be. Gerek

ev kes bi sebir bin, baldar bin, ne qure bin, nefsbîçûk bin, zimanê wan nerm be. Mehdê wan ji her xwarin û vexwarinê ra vekirî be.

2) Berhevkar divê ewilî xwe bigihîne wan kesên ku nas dike û bi wan ra têkilîyê dayîne û ji xwe ra cihê mayînê bibîne.

3) Berhevkar, divê armanca xebata xwe bi awayekî pir hêsan bi gotoxan bide famkirin. Li ser meseleyê, dikare bibêje, “Ez vê xebatê dikim ji bo ku çanda civaka me di nava dest û lingan da neçe.” Yan jî bibêje, “Ez vê berhevkarîyê dikim pirtûk û çap dikim.”

4) Divê berhevkar qîmetê bide gotoxên xwe.

5) Berhevkar, divê wê bawerîyê bide gotoxên xwe ku ew tiştên ji wan hildane bi tu kes û cihî ra bi par ve nake. Lê ev rewş li gor gotoxan diguhere, ji bo hinek gotoxan biparvekirina van tiştan ne mesele ye, lê dîsa jî destûra gotoxan hewce ye.

6) Divê berhevkar li qadê bi bîrdozîya xwe tev negere û kes bi bîrdozîya wê/î û fikrên wê/î yên sîyasî nezane.

7) Nêzîkbûna herêmê ya sîyasî û olî çî be divê berhevkar li gor wan tev bigere. Dibe

Peyvên kêmnas yên Pasûrê-2

Bahoz Baran



Amadekar û berhevkar:

Bahoz Baran

Gotox: Kemal Polat

Temen: 90

Perwerde: Nexwende

Herêm: Gundê Masirto/Pasûr/

Dîyarbekir

Gotox: Xanim Taman

Temen: 63

Perwerde: Nexwende

Herêm: Gundê Masirto/Pasûr/

Dîyarbekir

Ayolî:⁽¹⁾

r.z.>nt.

Keçikên ku nizanin malê bigerînin, ji tiştan fam nakin, nazikî ne.

Nimûne:

Ev keçika ayolî li me nayê.

Berçovî:

r. z.>nt. Kesê destbela û bêtevdîr.

Nimûne:

Ew merivekî berçovî ye.

Berdank:

n. z.>m. Îmkana firehbûna bîwara cihekî.

Nimûne:

Berdanka Licê heye, mal lê çêdibin.

Bilûzik:

r. z.>nt. Xîyar û qitîyên hûrik yên teze.

Nimûne:

Te çima evê xîyara bilûzik jê kir?

Celk:

n. z.>m. Rewşa ziwabûn û hişkbûna tiştên avî.

Nimûne:

Xwîn li ser lêvên wî bû celk.

Demikîn:

l. z.>m. Jêçûn û qelibîna rengê cil û bergan.

Nimûne:

Pantorê min piştî şuştinê demikî.

Devgelbûn:

l. z.>m. Rewşa başbûna aborîyê û pê ra jî qezenckirina pereyan.

Nimûne:

Ew jî êdî devgel bûne.

Dûtin:

l. z.>m. Seyandina erd û dîwaran ya bi herîyê.

Nimûne:

Me dîwarê xwe dût.

Gît:

(1) Peyv, ji "ayol" a tirkî derbasî kurdî bûye. Di tirkî da peyveka denglêkirinê ye ku bêhtir jin dibêjin.

n. z.>m. Qeza û belayên giran.
Nimûne:
Ev gîta jî ji pêşîya me derketa.

Havrûng:
n. z.>m. Rewş û dema guncan ya erdî.
Nimûne:
Êdî havrûnga wê ye, bikole.

Helegurzî:
r. z.>nt. Rewşa tiştên ku tam li bejna mirovî
tên. Ne dirêj ne kin.
Nimûne:
Ev cil li te hat, helegurzî ye.

Hurêj:
r. z.>nt Kesê ku mal û milk û pereyan dixwe.
Nimûne:
Kesên hurêj⁽²⁾ li şaredariyê civîyane.

Kêçokîbûn:
l. z.>m. Tapokîbûn, berî ku nan beyato bibe,
rewşa nîşaneyên gewr yê li ser nanî.
Nimûne:
Ev nan kêçokî bûye, dilê min narê.

Midas:
n. z.>m. Sol.
Nimûne:
Çika wan midasên min bide ez pê kim.

Oynedar:
r.z.>nt. Kesê ku dek û dolaban digerîne, dizane
tiştan li hev bîne.
Nimûne:
Tu li vê qîza oynedar binêre ji xwe ra!

Pejalî:
r. z.>nt. Ji hev bela, vekirî.
Nimûne:
Serê darê wî pejalî ye.

Rûpê:
n. z.>m. Gore.

Nimûne:
Min rûpê şûştin.

Qinûtik:
n. z.>m. Galgal, laqirdî.
Nimûne:
Kalê me dîsa ket qinûtikan.

Qûnzevî:
r. z.>nt. Malên ku alîyê wan yê paş digihîje
zevîyê û nizm dibe.
Nimûne:
Ez di vê mala qûnzevî da me.

Semsanat:
n. z.>m. Dewran.
Nimûne:
Semsenata wan hilweşîya.

Şepşepol:
r. z.>nt. Rewşa tiştên li bejnê nayên û fireh in.
Nimûne:
Ez vî cilê şepşepol li xwe nakim.

Şelûfk:
r. z.>nt. Dîk û mirîşkên kewikî, hûrik.
Nimûne:
De li vî dîkê şelûfk binêre çawa azan dide.

Terhîn:
n. z.>m. Dafikên kewan ku ji texteyan çêdikin
û devê wan ber bi hundir ve vedibe û kew di-
kevinê.
Nimûne:
Îsal gelek kew ketin terhînan.

Tît:
r. z.>nt. Dagirtî, tijî.
Nimûne:
Ev diranê min ne tît e.

Veperisîn:
l. z.>m. Jihevexistin, sistkirin.
Nimûne:
Bise bila dolmeyan veperisîne hîn bixwe.

(2) Marê hurêj heye, hema çî bikeve ber wî dixwe, efû nake.



Meleti

di Seyahetnameya Ewliya Çelebiyi da

Ozan Çiçek

Ji ber ku Ewliya Çelebî xwarzîyê Melîk Ehmed Paşayî ye û di nava artêşa Melîk Ehmed Paşayî da bûye, bi hêsanî di nava gelî da gerîyaye. Ew, tevî seferên artêşê jî bûye, bo nimûne sefera li ser Şingalê. Bi vê wesîleyê wî hem êzidî nas kirine hem jî komkujîya wan bi çavê xwe dîtîye û neqil kirîye. Seyahetnameya Ewliya Çelebîyî heta dawîya vê sedsalê jî ne populer bûye. Balkêşîya Ewliya Çelebîyî ew e ku xwendekarên post-modern di nava nivîsên wî da tiştên girîng û ne girîng ji hevdu venaqetînin. Di nivîsên wî da heterojenîyekê dibînin. Wekî ku me li jor jî dîyar kiribû, “Ewliya Çelebîyî di nava Seyahetnameya xwe da bûyerên polîtîk û efsaneyên pîroz, terîfa avakirina mizgeftekê û terîfa xwarinekê di nava hev da nivîsîye.”

Destpêk

Hem berîya Ewliya Çelebîyî hem jî piştî wî gelek gerok û lêkolînerên bîyanî li erdnîgarîya Kurdistanê gerîyane û lêkolîn kirine. Lê di nava van gerok û lêkolîneran da Ewliya Çelebî xwedîyê cihêkî girîng e. Bi gelemperî gerokên ku hatine ji gelî bêhtir di qonax û qesrên mîran da hatine verêkirin û ji gelî bi dûr mane, lê Ewliya Çelebî di nava gelî da gerîyaye û wî çavdêriya jîyana wan ya rojane kirîye. “Gerên Ewliya Çelebîyî, bi tenê ji çavdêriyên wî pêk nayên; wî ji her aliyê ve çavdêriya jîyana cihên ku lê gerîyaye kirîye û nivîsîye. Ev jî ji bo lêkolîneran dibe firsenda nixandîna û şiroveyê.”⁽¹⁾

Ji ber ku Ewliya Çelebî xwarzîyê Melîk Ehmed Paşayî ye û di nava artêşa Melîk Ehmed Paşayî da bûye, bi hêsanî di nava gelî da gerîyaye. Ew, tevî seferên artêşê jî bûye, bo nimûne sefera li ser Şingalê. Bi vê wesîleyê wî hem êzidî nas kirine hem jî komkujîya wan bi çavê xwe dîtîye û neqil kirîye. Seyahetnameya Ewliya Çelebîyî heta dawîya vê sedsalê jî ne populer bûye. Balkêşîya Ewliya Çelebîyî ew e ku xwendekarên post-modern di nava nivîsên wî da tiştên girîng û ne girîng ji hevdu venaqetînin. Di nivîsên wî da heterojenîyekê dibînin. Wekî ku me li jor jî dîyar kiribû, “Ewliya Çelebîyî di nava Seyahetnameya xwe da bûyerên polîtîk û efsaneyên pîroz,

(1) Gürhan, Veysel. (2008). *Ewliya Çelebî'nin Seyahatnamesinde Silvan*. Uluslararası Silvan Sempozyumu. Mardin Artuklu Üniversitesi. Şarkiyat Araştırmaları Derneği.

Amadekar:
Eşref Keydanî



Hevpeyvîn bi derwêşê folklorê ra

folklorame

Ez jî zehf razî me û xêrhatina Kovara Folklor Me dikim ku we ev derfet û biyav da min ez hinekî xeber bidim derbarê folklor û kesayetîya xwe û jîyana xwe da. Ez di sala 1956an da, 6ê meha adarê, li gundê Hesê Êso hatime dinyayê. Ji malbateka gundî, ji eşîra gabaran. Em xwedîyê erdî bûn, zevîyên me jî hebûn. Halê me baş bû, diqedîya. Min li wî gundî xwend, heta sala 1970yî min seretayî xelas kir, dûv ra ji 70yî vir da em hatin bajarê Heseke. Min xwendina navendî tamam kir. Gundê me, hemû mirovên hev bûn, hemû zevîdar bûn.

Eşref Keydanî⁽¹⁾: Li gor hin kesan ew kanîya folklor kurdan, li gor hin kesan jî ew derwêşê folklor kurdan e. Mêvanê mala me, Salihê Heydo ye. Birêz Salihê Heydo, ez ewilî li ser navê “Kovara Folklor Me” malavahîya te dikim ku te rê da min, ez dengê te bigihînim xwînerên kovarê. Li Rojavayê jixwe kes tune ye ku te nas neke û li Başûrê jî gelek kes te nas dikan. Li Bakurê, lêkolîner û folklor nas bi navê te hisîyane û hin berhemên te gihîştine vir jî. Lê bi giştî Salihê Heydo, nayê naskirin ji aliyê xwîner û xelkê ve. Ez dixwazim Salihê Heydo, li ser jîyana xwe hin agahîyan bide me da ku xwîner, vî xebatkar û kedkarê folklorê baş nas bikin.

Salihê Heydo: Ez jî zehf razî me û xêrhatina Kovara Folklor Me dikim ku we ev

derfet û biyav da min ez hinekî xeber bidim derbarê folklor û kesayetîya xwe û jîyana xwe da. Ez di sala 1956an da, 6ê meha adarê, li gundê Hesê Êso hatime dinyayê. Ji malbateka gundî, ji eşîra gabaran. Em xwedîyê erdî bûn, zevîyên me jî hebûn. Halê me baş bû, diqedîya. Min li wî gundî xwend, heta sala 1970yî min seretayî xelas kir, dûv ra ji 70yî vir da em hatin bajarê Heseke. Min xwendina navendî tamam kir. Gundê me, hemû mirovên hev bûn, hemû zevîdar bûn; kêf, şahî û xweşî di nava wan da gelekî digerîya û hemû jî rewşenbîrên dema xwe bûn. Bavê min bi xwe jî ji wan rewşenbîran bû. Bi kurdî dixwend û dini-vîsî. Şiîrên Ehmedê Xanî, Melayê Cizirî û Feqîyê Teyranî dixwendin. Bi xweşîkî tê bîra min, di rojên eyd û şahîyan da jinên

(1) Di vê hevpeyvîna hanê da, keda nivîskar û rojnameger birêz Ferid Mitan zehf zêde ye. Min pirs amade kirin û bi rêya e-mailê ji wî ra şandin û wî pirsên min ji Salihê Heydo yî kirin. Herweha qeyda dengî ji min ra şand û fotograf jî hildan. Mala wî hezar carî ava be.

Kose

Kosê reben sutê xwe xwar dike, tê ji jina xwe ri divê, hal merselê axa ji vir heya vir i. Kose radibi eyarê gayê xwe xwê diki, dipêçi. Ji jina xwe ri divê: “Keçê ez ê vî eyara bivim Carbekir, hela ji xwe ri nafroşim.” Kose eyar dixi kîs, hişk devê kîs girê didi o berê xwe didi Carbekir. Kose dikevi dikanik a basme masme lê yî, ji xwedyê dikanê ri divê:

Kose, ji gundê Şemrex e. Rokê axa tê mala Kose, jê ri⁽¹⁾ divê:
 “Kose! Pêşîya me rojî yi. Em ê her royê yek gayê xwe ser jê kin, di meha rojîyê di⁽²⁾ em ê pir birçî bivin, ji bo wê jî em ê goşt têr bixwin. (Axa ji Kose ri divê) Hema ewilê em ê, ê te ser jê kin.”

Kose divê:

“Ser çava.”

Radibin gayê Kose ser jê dikin, goşt li hev payê dikin. Goştê gayê Kose dixwin. Goşt diqedî, Kose berê xwe didi mala axê, ji axa ri divê:⁽³⁾

“Axa îjar dora kê yi, em gayê wan ser jê kin?”

Axa ji Kose ri divê:

“De wê di heri lo, ma ew ê kî gayê xwe ser jê ki, ferzî tu ehmeq bû, de heri mala xwe.”

Kose divê:

“Ma wer dibe? We gişa goştê gayê mi xwar, weleh ez vê yekê qebûl nakim.”

Axa divê:

“De bicheimi her mala xwe, hîn mi te nedayi ber pihîna.”

Kosê reben sutê xwe xwar dike, tê ji jina xwe ri divê, hal merselê axa ji vir heya vir i. Kose radibi eyarê gayê xwe xwê diki, dipêçî. Ji jina xwe ri divê:

“Keçê ez ê vî eyara bivim Carbekir,⁽⁴⁾ hela ji xwe ri nafroşim.”

Kose eyar dixi kîs, hişk devê kîs girê didi o berê xwe didi Carbekir. Kose dikevi dikanik a basme masme lê yi, ji xwedîyê dikanê ri divê:

“Tu vî kîsa bi basme nadi?”

Mêrikê dikançî divê:

“Çi di kîs di yi? Ka devê kîsê xwe vek, ez lê binêrim.”

Kose divê:

“Bi navê Xwedê ez devê kîs venakim, lê tu poşman nabi. Eger tu hinik basme masme bidi mi, ez ê kîs bidim te.”

Mêrik diki naki nikari bi Kose ri serî derxi. Mêrik têra



Gotox: Hecî Eysê

Berhevkar: Remzîye Oncel

Gotox: Hecî Eysê

Temen: 73

Perwerde: Xwende


Herêm: Şemrex/Mêrdîn

Dîroka berhevkirinê: 2018

(1) Ev paşdeçka “ra”yê ye. Li gelek deverên Mêrdînê wekî “ri”yê ji devan dertê.
 (2) Ev paşdeçka “da”yê ye. Li gelek deverên Mêrdînê wekî “di”yê ji devan dertê.

(3) Divê: Dibêje.

(4) Carbekir: Diyarbekir.



سلطان صالح الدین ایوبی
 [حقوق منلیهسی] بابنعلی جوارنده ابوالسعود جادسته نومر ۱۹

Amanic ji sazê
 kên e ku tenê bi x
 li gora bingehên
 Bi rastî ji vî alî
 ê beştes di rewş
 bîha. Di meydana
 krîştîyan tanekar ên
 nê bi temamî bêt
 Di vê demê da
 wan alayan da di
 qetîna û bîstîna ku tesaduf di vedsalan da ançax carek jîbo mefadarîyê tîne
 ber nîweweyan, aha di vê demê da, çî şansêkî xirab ê azarde ye ku em, jîbo dew
 kîna, heqê xwe li pêşberê medenîyê, rastê gelek alîdîyên mezîna tîn.
 Dibêjin ku "Bemex heq û bîlêqana nîweweyan, hebûna tarîxê ye û hebûn
 zîmînekî wê ye ku beramberê çerçeyana demê be, yanî hebûna sargehên r

Folklor, îdeolojî û netewesazî



Serwext Zana

Xelil Xeyalî û keça xwe
Naciye Modan (Naco)

Gel, civak û kom, bi xurtbûna folklorê xwe ji paşerojê ra amade ne û herweha bi dewlemendiya berhemên xwe yê folklorî, ji aliyên kom yan civakên din ve têt nasîn. Ji bo naskirina kom, civak yan gelan xebatên folklorê cihê girîng digirin. Hemû jîyana gelan yan jî ya civakê di folklorê wan da nixumandiye. Çunku çîrokên wan, bîr û baweriyên wan û her çî be jî li gor jîyana wan ya rastqîn û li gor çanda wan û herweha li gor erdnîgarîya ku têt da dijîn dîzayn dibe. Ev tiştêkî xwezayî ye û gel bi vî awayî jîyana xwe didomîne

**Qewlê “Meshefa Reş”
bi zar di sîstêma qewl
û beytên êzidîyan da**

Celîlê Celîl

folklorame

Bi giştî li ser êzidîyatîyê; rojhilatnas, dîplomat, rêwî, dost û nedost her kesî nivîsiye. Pirtûk û gotar bi fransizî, almanî, îngilîzî, îtalî, rûsî, ermenî, erebî, tirkî; bi gelek zimanan çap bûne. Lê piraniya wan xebatan her tenê li dora ola êzidîyan zivirîne û bi zanîna xwe di kêrahîya bîr û bawerîya êzidîyan da nekarîne noq bibin. Ji ber vê jî derbarê êzidîyan û ola êzidîyan da gelek tiştên nerast û bêbingeh hatine nivîsîn.

Di dawîya sedsalîya XIX. û destpêka sedsalîya XX. da, ji aliyê zanyaran ve du pirtûkên êzidîyan yê pîroz ketin destên xwendevanan. Yek ji wan “Kitêbî Celwe” bû, ya din “Meshefa Reş” bû. Nivîsên van her du pirtûkên xef, hatin xwendin û bi pirtûkekê, tevî wergera wan ya almanî û bi vejandineka lînguîstîk bi destê rojhilatnasê Awisturyayî, Martîn Hartmannî sala 1913an li Vîyanayê hatin belavkirin.⁽¹⁾

Ew her du pirtûk bi naveroka xwe balkêş bûn. Balkêşîya van destnivîsan ji bona zanariyê heta roja îro jî dom dike. Ew destnivîs, ku bi zimanê kurdî hatibûn nivîsîn,

heta niha li çend zimanan hatine wergerandin û li ser wan çend lêkolîn û gotar hatine belavkirin.⁽²⁾

Malûmatî li ser heyîna destnivîsa “Meshefa Reş” û “Kitêbî Celwe”yê di nava êzidîxanê da tune bûye. Şêx û pîrên êzidîyan qal nekirine. Bawer dikim, belkî di nava tirêqên êzidîyan da jî kêmirov hebûne ku haya wan ji van her du destnivîsan hebûye. Tê famkirin ku xwendina van nivîsan qedexa bûye, ji ber ku ev pirtûk xef bûne, axaftina li ser wan jî qedexa bûye.

Bi giştî li ser êzidîyatîyê; rojhilatnas, dîplomat, rêwî, dost û nedost her kesî nivîsiye.⁽³⁾

(1) Bittner M. Die heiligen Bücher der jeziden oder Teufelsanbeter (kurdisch und arabisch). Denkschriften der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften in Wien. Philosophisch-Historische Klasse. Band LV. Wien 1913.

(2) Jakob G. Ein neuer Text über die Jezidîs. Beiträge zur Kenntnis des Orients. Halle., 1909. Bd. 7. S.30-35; Joseph Isya. Jezidî texts. „American Journal of Semitic Languages. Chicago. 1909.Vol. 25, Nr. 2-3. P.111-156, 218-254; Anastase M. La découverte récente des deux livres sacrés des Yézidîs. Anthropos. Wien, 1911. Bd. 6.S. 1-39; Bittner M. Die beiden heiligen Bücher der jeziden im Lichte der Textkritik. Anthropos. Wien 1911. Bd. 6. S. 628-639; Joseph Isya. Devillworship: The sacred books and traditions of the Yezidis. Boston, 1919; Mingana A. Sacred books of the Yezidis „Journal of the Royal Asiatic, Society of Great Britain and Ireland“ 1921. January. P. 117-119

(3) Binêre J.S. Mûsaelyan, Bibliografiya po kûrdovêdeniyû“T. I, II, Sankt Peterburg 1966.

رہنگھہ دانا ئہ فسانئ د مہم و زینا (ئہ حمہ دئ خانئ) دا
بہرہہ فکرن: م شفان جرجیس



پیشہ کی

رهنگه‌دانا ئەفسانێ د مەم و زینا (ئەحمەدی خانی) دا

بەرھەفکر: م شفان جرجیس

پێشەکی

ئەفسانە دخواندن و فەگولینێن نویدا ب دیاردەیه‌کا رهوشەنیری دهیته هژمارتن، ژبەر فی یه‌کی چه‌ندین یواران گرنگی ب ئەفسانێ دا لدویف نیرینا خو فەگولین لسه‌ر ئەنجامدایه، هه‌روه‌سان ئەفسانە ب سه‌رو کانیه‌کا هه‌ره باشه ژبو ئەده‌بیاتی‌ن که‌فن و نوی، ئانکو نفیسه‌ر دشین مفای ژێ وهر‌بگرن، ئەده‌بیاتی‌ن کوردی ژێ وه‌کو به‌شه‌ک ژ ئەده‌بیاتی‌ن جیهانی ئەفسانە دنا‌ف ئەده‌بیاتی‌ن خودا بکارئینایه.

بابه‌تی فەگولینامه بناقونیشانی (رهنگه‌دانا ئەفسانێ د مەم و زینا (ئەحمەدی خانی) دا.

ئارمانج ژ فەگولینێ ئەوه دیاربکه‌ین کو ئەفسانا کوردی چه‌ندا ده‌وله‌مهنده دبیاقی ئەفسانیدا. سنوری فەگولینێ، ئەف فەگولینه بتنی هوزانا کلاسیک بخوفه دگریت ب تایبه‌ت دیوانا (ئەحمەدی خانی)، دیسان گرنگیا فی فەگولینێ یا د وی یه‌کی دا داکو دیاربکه‌ت ئەری هوزانا کلاسیک تا ج راده شایه مفای ژ ئەفسانێ وهر‌بگریت و ژبو ج مه‌رم بکارئینایه.

پێکهاتا فەگولینێ ئەف فەگولینه پێک ده‌یت ژ دوو پشکان لدور ئەفسانێ، پشکا ئیک ژ: { تیگه‌ه و پیناسین ئەفسانێ، په‌یدا‌بوونا ئەفسانێ، جورین ئەفسانێ: (ئەفسانا گه‌ردونی، هودوزی، ئایرده‌یی، قاره‌مانی خواوه‌ند، دیروکه ئەفسانە، هی‌مایی)، ئەفسانا کوردی، تایبه‌تمه‌ندی‌ن ئەفسانێ: تایبه‌تمه‌ندی‌ن: (زمانی، می‌زوویی، ئاینی، جوگرافی، داب ونه‌ریتین کومه‌لایه‌تی)، جورین ئەفسانا کوردی، ره‌گه‌زین ئەفسانه‌یی: (ده‌م، جه، هزر، که‌سایه‌تی) یین ئەفسانه‌یی. پشکا دووی: پراکتیک‌کر: . که‌سایه‌تی‌ن ئەفسانه‌یی: (روسته‌می زال، شه‌هره‌زاد، لقمان جکیم، گودرز کشواد)، ژمارین ئەفسانه‌یی: (ئیک، دوو، سی، چار)، گیاندارین ئەفسانه‌یی: (شه‌یتان، حوری، هاروت، ئیزراییل)، گیانه‌وه‌رین ئەفسانه‌یی: (السمندر، سیمه‌رخ، دیو، ئەژده‌ها)، که‌ره‌ستین ئەفسانه‌یی: (گوپالی موسای، گوستیرکا سلیمان، جاما جمشید). هه‌روه‌سان ل دوماهیک ب چه‌ند ئەنجامان و لیسته‌کا ژیدهران ب دوماهیک ده‌یت.

پشکا ئیک:

ئەفسانە تیگه‌ه و پیناسه و جور:

أ- تیگه‌ه و پیناسین ئەفسانێ:

هه‌لبه‌ت بو فی بابه‌تی چه‌ندین پیناسین جودا جودا بو هاتینه کرن، هه‌ر ئیکی ل

دویف دیتن و بوچوون و ئاستی هزری و زانستی خو پیناسه کریه، (فونک) دپیناسا خودا بو



